Kürlerin, Kürd aydınlarının, Kürd siyasetçilerinin bu konudaki tutumları elbette çok önemlidir. Bunların çok önemli bir kısmı da Kürdçe konuşmayarak, yazmayarak, Kürdçe öğrenmeyerek, çocuklarına, Kürdçe öğretmeyerek, çocuklarının, Kürdçe öğrenmesini, konuşmasını sağlayacak bir ortamın oluşmasını sağlamayarak, her alanda, Türkçe kullanarak, devletin bu politikalarına, uygulamalarına büyük bir katkı sunuyorlar. Halkın sesi ve tarihi de bu süreçte siliniyor.

Selahattin Demirtaş, bugüne kadar birçok öykü yayımladı. Şiirler yayımladı. Öykülerinin Seher (Dipnot Yayınevi, 2017, Ankara) isimli bir kitapta topladı. Son olarak da Korkma başlıklı bir şarkı besteledi. Şarkının sözleri de, müziği de kendisine ait. Bu ürünlerin hepsi de Türkçe. Korkma şarkısının sözleri de, müziği de Türkçe.

Bu şarkının sonunda, Selahattin Demirtaş, halka, şarkısının beğenilip beğenilmediğini de soruyor. Şarkısının beğenilip beğenilmediğinin mesajla kendisine iletilmesini istiyor. Ben de Selahattin Demirtaş'ın iyi niyetine sığınarak bu ürünlerle ilgili düşüncelerimi, duygularımı belirtmek istiyorum.

Kürtlerin, Kürdçe'nin, Kürdistan'ın durumunu anlatmakta kullanılan birçok kavram var. Bunlardan biri de 'sesi ve tarihi silinmiş bir halk' kavramıdır. Örneğin, çevirmen Caroline Strckert'in, Haydar Karataş'ın, 'Ejma'nın Rüyası kitabının, (Notabene, Eylül, 2017) arka kapağında yer alan, Kürdleri tanımlayan cümlesi böyle...

Bir halkın sesi ve tarihi nasıl silinir? Bu, çok bilinen, incelenen bir konudur. Ayrıca, hala incelenmesi gereken bir konudur. Bu konuda, Türk, Arap ve Fars devletlerinin politikalarını, bu politikaların nasıl uygulandığını yakından biliyoruz. Bu politikaların esasının asimilasyon olduğunu da biliyoruz. Asi milasyon politikasının, uygulamasının esası da şudur. 'Bir Kürde, Türk olarak herşey, Kürd olarak hiçbirşey'...Bu devletler, devletin ideolojik baskı araçlarını ve zorlayıcı baskı araçlarını sistemli bir şekilde, kararlı bir şekilde uygulayarak asimilasyonu gerçekleştirmeye, asimilasyona karşı direnmeye çalışanları da fiziki imha yöntemleriyle, sürgünlerle, yerlerinde yurtlarından ederek, etnik temizlik yaparak vs. yok etmeye çalışıyorlar.

Kürlerin, Kürd aydınlarının, Kürd siyasetçilerinin bu konudaki tutumları elbette çok önemlidir. Bunların çok önemli bir kısmı da Kürdçe konuşmayarak, yazmayarak, Kürdçe öğrenmeyerek, çocuklarına, Kürdçe öğretmeyerek, çocuklarının, Kürdçe öğrenmesini, konuşmasını sağlayacak bir ortamın oluşmasını sağlamayarak, her alanda, Türkçe kullanarak, devletin bu politikalarına, uygulamalarına büyük bir katkı sunuyorlar. Halkın sesi ve tarihi de bu süreçte siliniyor.

Bunun, Türk diline, Türk kültürüne hizmet olduğu açıktır. Türk aydınlarının, yazarlarının, siyasetçilerinin büyük bir kısmı, bu tutumundan dolayı Selahattin Demirtaş'a övgüler düzüyorlar.

Bunu anlamak mümkündür. Fakat, bu becerilerinden dolayı, Kürdlerin önemli bir kısmı da Selahattin Demirtaş'a alkış yapıyorlar. Bunu anlamak ise mümkün değildir. Halbuki, Selahattin Demirtaş'ı 'Neden kendi ana dilinle yazmıyorsun?' diye eleştirmek çok daha önemli bir tutumdur. İşte bu tutum, asimilasyonun yaygınlığını ve derinliğini göstermektedir.

'Dil çok mu önemli 'diyenler olabilir. Elbette çok önemlidir. Eğer, siz, 'dil o kadar önemli değildir' diyorsanız, ikinci sınıf Türk olabilmek için bu kadar çaba göstermek yerine, devletin her dediğini yaparak, devlet görüşüne, resmi ideolojiye tamamen teslim olarak birinci sınıf Türk olursunuz.

Devletin, bu teslimiyet sürecinde, ilk olarak dediği, diyeceği husus elbette, Kürd dili ile ilgili olacaktır. Bu süreçte, devlet, Kürdlere, 'bırakın bu ilkel dili,

eleştirilmesi gereken, Kürdlerin kendi dilleri karşısındaki bu sakat tutumdur. Bugün, Kürdlerin, en fazla ihtiyaç duydukları alan eleştirilme olmalıdır...

Halkların Demokratik Partisi'nin programında, Kürd diline hizmet etmek, Kürd kültürüne hizmet etmek önerileri bulunmaktadır. Bu hizmetin yapılıp yapılmadığını, nasıl yapıldığını kişi olarak bilmiyorum. Ama, Halkların Demokratik Partisi, gerek gerek merkezde, gerek taşrada, örgütlü olduğu Kürd şehirlerinde vs. her alanda Türkçe kullanarak, devletin asimilasyon politikasına, Kürdlerin Türklüğe asimilasyonuna, bu politikayı uygulanmasına çok daha büyük hizmet ediyorlar. Bu çok daha somut, izlenebilir, gözlenebilir bir süreçtir.

Ortadoğu'da, Filistinli Arapların ve Kürdlerin mücadelesini karşılaştırmak bize, Kürd ve Arap



Türkçe konuşun, çocuklarınızın Türkçe konuşmasını sağlayın...' diyecektir.... Devlet, dilin ne anlama geldiğini çok yakından anlamıştır. Bu yeni bir durum değildir, İttihat ve Terakki'den beri, hatta Yeni Osmanlılar'dan, Namık Kemal'den beri bu, böyledir. Kürdçe'nin inkarı, Kürdçe yasakları, Kürdçe eğitiminin imkansız olduğunun söylenmesi bununla ilgilidir. Şunca mücadeleye rağmen, şunca ödenen bedele rağmen, Kürdlerin çok önemli bir kısmının hala bunu kavramamış, bunun bilincine varmamış olmaları çok şaşırtıcı bir durumdur.

\*\*\*

Yukarıda, Selahattin Demirtaş'ın öykü, şiir, şarkı gibi ürünlerini hep Türkçe verdiği söylenmiştir. Bunun Türk diline ve Türk kültürüne hizmet olduğu da söylenmiştir. Devlet, bu süreçten dolayı elbette memnundur. Ama, Kürdlerin kendi görüşüne daha fazla teslim olmalarını arzu ettiği için, bu memnuniyetini dile getirmemeye çalışır. Ama şurası açık, Selahattin Demirtaş Kürd olduğu için cezaevinde tutulmaktadır. Kürd sorununa çözüm arama iddiasıyla kurulan bir siyasal partinin yöneticisi olduğu için cezaevinde tutulmaktadır. Tutuklu veya hükümlü öbür milletvekillerinin durumu da aşağı yukarı böyledir.

Dikkat edilirse, burada, dile getirilen hak, yani Kürdçe'nin, toplumsal, siyasal ilişkilerin her alanda yaşanması, kullanılması, radikal bir istek falan değildir. Çok doğal olan bir istektir. Bunun Kürdlerde, böylesine sorunlu bir hale gelmiş olması konusunda, devletlerin politikaları, uygulamaları elbette eleştiri konusu olmalıdır. Ama birinci planda

sorunları hakkında, Filistin sorunu hakkında, çok önemli bilgiler vermektedir, bilgilerimizi çoğaltmaktadır. Örneğin, FKÖ Lideri Yasser Arafat'ın, (1929-2004) veya Filistinli Arapların herhangi bir yöneticisinin, Arap dilini bırakmış, İbrani diliyle şiirler yazdığını, şarkılar bestelediğini, Arap melodileri yaptığını düşünün... Bu süreç Filistinli Araplarda nasıl bir etki yaratır?... Bunu uzun uzun düşünmek gerekir. Kürd sorununun çok farklı bir sorun olduğu söylenebilir. Elbette çok farklıdır. Fark, Kürdlerin sesinin ve tarihinin silinmiş olmasıyla ilgilidir. Kürdlerin sesinin ve tarihinin silinmiş olmasıyla ilgili olarak devletin, devletlerin politikası, uygulamaları nedir? Bu politikalara, uygulamalara karşı Kürdlerin tutumu nedir? Bu süreçlerin zaman ve mekan içinde incelenmesi önemli olmalıdır. 'Kürdlere devlet gerekmez' deyip, Filistinli Araplara ısrarla devlet olmayı savunan görüşün çelişkisi, sahteliği de bu çerçevede daha iyi anlaşılır.

2013 yılında, Diyarbakır'da, bir 'Çözüm Toplantısı' olmuştu. Bu toplantıya, İBV'den bir arkadaşla biz de katılmıştık. Doğal olarak toplantıyı düzenleyenler, toplantıyı izleyenler, Kürd'dü. Konuşmacı veya izleyici birkaç Türk, olabilir, Ama çok büyük bir kesim Kürd, Ermeni, Süryani, Ezidi Kürd vs. idi. HDP'den bir arkadaş Roboski'de yaşanan zulmü, işkenceyi vs. anlatıyordu. Devletin baskısını, zulmünü eleştiriyordu, devleti suçluyordu. Ama bunu Türkçe olarak, Türk diliyle anlatıyordu. Bu durum beni çok şaşırtmıştı.

Devletin bu konudaki beklentisi, duyguları, düşünceleri kanımca şudur: '... Sen beni istediğin gibi eleştir, suçla... Ama sen

benim istediğim gibi olmuşsun, Bu çok iyi... Ben ne diyorum, 'Bu ilkel dilinizi bırakın, Türkçe konuşun, dünya ile ancak Türk diliyle bütünleşebilirsiniz...' Ben bunları söylüyorum, sen de benim istediğim gibi artık Türkçe konuşuyorsun... Beni eleştir, suçla, bundan bir şey çıkmaz. Önemli olan senin Türkçe konuşman... Ben de bunu istiyorum...'

Devletin, Roboski'de, yaşanan zulmü baskıyı, Türkçe anlatan kişi ile ilgili olarak, şöyle bir beklentisi de vardır. '...Sen konuşmanın başında kendi dilinizle birkaç laf ettin, ileride çocukların o birkaç lafı da edemeyecek... Torunların, torunlarının torunları vs. Kürd olduklarını bile bilemeyecek, 'atalarımız Kürdmüş...' diyecekler... Devletin bu algısı karşısında Kürdler nasıl bir tutum sergilemeli?

Yine bu yıllarda, 2016'de, Derim'de, bir toplantı düzenlenmişti. Ağuşan Ocağı'ndan 22 Pîr', Temmuz 1938'de, evlerinde toplanıp yakılmışlar, Ev içindeki insanlarla birlikte yakılmış... Konuşmacılar, Ağuşan Ocağı'nın bugünkü torunları, bu sürecin nasıl yaşandığını anlatılıyordu. O günlerde, Hozat'da, Sekesor Dağı'nda, toplu mezarların açılıp, kemiklerin bulunup, bu Pîrler için bir mezar yapmak çabası vardı. Bu toplantıya, Cizre'den birkaç kadın da katılmıştı. Bu kadınlar da Cizre'de, 2015 yılında, 'Hendek Savaşı' sırasında, yaşanan baskıyı, zulmü anlatıyorlardı. Bu zulmü yaşamış bir kadın, konuşmasına, 'Sizlere, Türkçe hitap edemediğim için özür diliyorum, kendi dilimle konuşmak zorunda olduğum için utanıyorum...' diye başlamıştı. Bu konuşma da beni çok şaşırtmıştı. Çünkü, birkaç konuşmacı veya birkaç dinleyici hariç, toplantıyı izleyenlerin çok büyük bir kısmı Kürd'dü.

HDP'de Kadın Kolları, Gençlik Kolları gibi birçok örgütlenmeler var. Eğitim çalışmaları da var. Sözü edilen kadın da Kadın Kolları'nda çalışan bir kadın... Acaba, bu kadın, nasıl bir eğitim aldı da kendi öz diline bu kadar yabancılaşmış, bunca zulme rağmen, zulüm yapanları diliyle konuşmak istiyor, konuşamadığı için, izleyicilerden özür diliyor?

24 Haziran 2018 Genel Seçimlerinin ve Cumhurbaşkanlığı seçimlerinin bu açıdan irdelenmesinde yarar vardır. Seçimler sonunda HDP TBMM'de 67 milletvekili ile temsil edilmektedir. Geleceği okumak, kavramak için şu soruların sorulması gerekir kanısındayım. Bu milletvekillerin kaç Kürd'dür? Bu milletvekillerinin kaç Kürdçe konuşabilmektedir, yazabilmektedir? Bunlardan çok daha önemli olan soru şudur. Bu milletvekillerin çocuklarını kaç Kürdçe konuşabilmektedir, yazabilmektedir? Bunlar kadar önemli bir soru da şu olmalıdır. Bu milletvekillerin kaç, aklam evine döndüğü zaman, sofrada, salonda vs. eşiyile, çocuklarıyla Kürdçe konuşmaktadır? Geleceğin, neler getireceği konusunda bu sorular üzerinde, bunun gibi sorular üzerinde düşünmek gerekir.

'Sesi ve tarihi silinmiş bir halk' kavramını artık, Türk aydınları da kullanıyor. Ama, Türk aydınlarının, yazarlarının, siyaset adamlarını

büyük bir kısmı, Kürdlere, 'kendi sesiniz bulun, tarihinizi kendiniz yazın 'demiyor, 'herşeyi enternasyonalizm çözer' diyerek, Kürdlere bu düşüncüyü şırınga ediyor. Her türlü olanağa, donanıma, sahip Türk, Arap ve Fars devletleriyle, hiçbir olanağa, donanıma sahip olmayan, hiçbir olanağa, donanıma sahip olamaması için çok yoğun bir şekilde çaba gösterilen Kürdlerin aynı süreç içinde değerlendirilmeleri, Kürdleri ötelemekten, Kürdleri bu devletin, devletlerin asimilasyon politikası içinde eritmekten başka bir sonuç vermez. Kendi olmayan Kürdlerin, enternasyonal olmaları, Kürdleri eritmekten başka bir sonuç vermez. Enternasyonal olmak, kendin olmakla başlar. Kendin olmanın temel koşulu ise, ana diline sahip olmak, anadilini yaşamak, en azından bunun kaybının çok büyük bir eksiklik olduğunun bilincine varıp bunu kazanmaya çalışmaktır. Bu, Kürdlükten, Kürdlük mücadelesinin yapılmasının gerektirdiği işlerden kaçıştan başka bir şey değildir. Kürdlerin savunmaları gereken kardeşlik gibi, halkların kardeşliği gibi sahte, karşılığı olmayan görüşler değildir. Eşitlik, eşit olmaya çalışmaktır. Eşitlik, toplumsal, hukuksal eşitlik yanında siyasal eşitliği de içerir.

Kürd dilini savunmayan, Kürd diliyle yaşamayan Kürdlerin, Türk solunu TBMM'ye taşıma gayretleri, Adil Yılmaz'ın ve Mücahit Bilici'nin dediği gibi hamallıktan başka bir şey değildir. Çünkü Kürdlerin taşıdığı yük kendilerine ait bir yük değildir. Başkalarının yüküdür. Kendi yükleri ise, ortada durmaktadır, biriktirmektedir, büyümektedir. Türk solu, kendi olmayan bu Kürdlere, kendi yüklerini de hatırlatmalıdır.

Bu noktada, milliyetçilik ile ilgili birkaç cümle yazmak gerektiğini hissediyorum. 1960'larda, 1970'lerde, 1980'lerde vs. Kürdler, Kürdçe konuştukları zaman, Kürdçe konuşma isteğinde buldukları zaman, Türk solcuları da, ümmetçi enternasyonalciler de, Kürdleri 'milliyetçilik yapmayalım' diye uyarırlardı. Ve bu hatırlatmalar, Kürdler üzerinde çok etkili olurdu. Kürdler, böyle bir eleştiri karşısında kalmamak için Kürdçe'den uzak durmaya çalışırlardı. Kürdlerin, baskı, zulüm altındaki dillerini günışığına çıkarma çabalarına milliyetçilik diyerek karşı çıkılırdı.

Bugün de durum pek farklı değil... Halbuki, Tür solcuları da Türk sağcıları da doğal olarak Türkçe konuşuyor. O zaman, Türk sağcıları, Türk solcuları, Kürdçeyi eşit kılma isteğine 'milliyetçilik' denerek neden karşı çıkıyor? Ayrıca, Kürdlerin elbette milliyetçi olmaları gerekiyor. Çünkü baskı altında olan bir dil var, yasaklanan bir dil var. Bunu gün ışığına çıkarma çabaları, bilakis evrensel bir özgürlük arayışıdır, baskıya, zulme karşı direniştir...

Ama Türk solcularının da Türk sağcılarının da çok büyük bir kısmının, sahip oldukları bu ayrıcalığın bilincinde bile değildirler. Bunu, Barış Ünlü, Türklük Sözleşmesi (Dipnot, 2018) isimli çok değerli çalışmasında, çok açık bir şekilde, ayrıntılı bir şekilde açıklıyor. [nerinaazad.org](http://nerinaazad.org)



## PAK Vedat Aydın bi bîrtîne

Em welatperwerê Kurd Vedat Aydın bi giramî bi bîrtînin JITEM a Dewleta Tirkîyeyê, Vedat Aydın di roja 05.07.1991ê de revand. Di roja 07.07.1991ê de termê wî li kêleka rê hate dîtin. Vedat Aydın bi îşkenceyê hati-



bû qetil kirin.

Di roja 10ê Tîrmeha 1991ê de bi deh hezaran kes li Amedê beşdarî merasîma cenazeyê Vedat Aydın bûn. Polîs û hêzên taybet yê Dewleta Tirkîyeyê bi çekan êrîşî ser girseyê kirin. Di encama vê erîşê de gelek kes hatin kuştin û birîndar bûn. Lê dîsa jî termê Vedat Aydın li Amedê hete defin kirin.

Vedat Aydın kadroyekî KIP/DDKDyê bû û ji vê dozê di hefsa Dîyarbekirê de raza bû. Gava ku hate qetilkirin jî Serokê Teşkilata HEPê ya Amedê bû.

Em di 27emîn salvegera şehadeta wî de, welatperwerê Kurd Vedat Aydın û hemû şehîdên Kurdistanê bi giramî bi bîrtînin.

rojevakurd.com

## Komisyone hejmartina dengên Kerkûkê bi dawî kir

Encûmena komisyona serbixwe ya helbijartinan ragehand ku, proseya cuda kirin û hejmartina dengên Kerkûkê bi dawî bû.



Serokê komisyona serbixwe ya helbijartinan Dadwer Fayq Zêdan ragehand ku, proseya cudakirin û hejmartina beşek ji sindoqên dengên li Kerkûkê bi serkeftin bi dawî hat.

Herwiha Serokê komisyona serbixwe ya helbijartinan Dadwer Fayq Zêdan d zanîn ku, prose bi serperîştîya wan dadwerên ku, ji aliyê encûmena dadwerî bo rêvebirina komisyone hatibû damezarandin hat kirin. Tekez kir ku, prose piştî 5 rojan ji destpê kirina wê îro bi dawî hat û li gor encaman dengê YNK kêmbûne.

BasNews

## Sêyem mezintîrîn kompanî di cîhanê de ji Îranê vekîşiya

Sêyem mezintîrîn kompaniya barkirina deryayî di cîhanê de CMA CGM a fransî ji Îranê vekîşiya.



Serokê encûmena rêveberiya kompaniyê Rodolv Seade di çarçoveya dîdareke aborî de ragehand ku, bi sedema sepandina sizayên Trump li ser Îranê me biryar da xizmetguzariyên xwe li wî welatî bi dawî bînin.

Kompaniya Fransî CMA CGM di sala 2016ê de rêkeftinek bi kompaniya hêlên barkirina deryayî ya Îranê re bi armanca hemahingiya hevbeş imze kiribû.

Serokê Amerîkayê Donald Trump di meha Gulana borî xwe ji rêkeftina atomî ya bi Îranê re ku, di sala 2015ê hatibû imzekirin vekîşand û careke din siza li ser wî welatî sepandin.

BasNews

## Serok Barzanî li gel şandeye hevbeş a lîsta Fetih û Dewleta Yasa re civiya

Serok Barzanî li Selaheddîn li gel şandeye hevbeş a danûstandinkarên herdu lîsteyên Fetih Dewleta Yasa re civiya.


wendiyên dîrokî yê di navbera gelê Kurdistanê û hêzên Iraqîyan û qurbanîdana hevbeş li dijî dîktatoriyetê kirin û daxwaz kirin ku li

şanda mîhvan nêrîna siyasî ya Lîsta Fetih û Dewleta Yasa ji bo Serok Barzanî şîrove kir û ronahî xiste li ser nêrîna her dû lîsteyan ya ji bo pêkanîna kutleya mezina Parlemenî û nivîsîna programa îdareya welat li qonaxa pêş da.

Her li vê civînê de di derbarê gefan û bi cîhkirina destûrê de danustandina bîr û ramanan kirin û her dû alî li ser ewe hevber bûn ku pêwîste peywendiyên dîrokî û bi cîhkirina destûr û her wiha lojîk û eqlaniyet bikin hewêna proseya siyasî û prensîpên şeraket û tewafuq û hevsengî li proseya siyasî da peyrew bikin û li bin ronahiya wan sê prensîpan kutleya mezina parlemen dabimezrê û Hikûmeta nû bê pêkanîna û pêwîste hemû aliyek ji bo wê menhec û bingehana vegeerîna ku li piştî 2003 Iraqa nû li ser hatiye avakirin.

Hêjayî gotinêye ku li vê civînê de Fazil Mîranî Sekreterê Mekteba Siyasî û Azad Berwarî Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Kurdistanê amade bûn.

BasNews



Roja şemî 07.07.2018 li Selaheddîn Serok Mesûd Barzanî pêşwaziya şanda hevbeşa danustandinkarê her dû Lîsta Fetih û Dewleta Yasa kir.

Li hevdiînê de şanda mîhvan ji bilî balkişandina li ser rol û pêgeha Serok Barzanî li binyatnana Iraqê û her wiha êş û azar û qurbanîdana dehan sala gelê Kurdistanê, tekez li ser pey-

Iraqê da hemû aliyek bi pêkve qonaxekî nû destpêbikin û şaşiyên berê dîbare nekin û bi navê gihîştina aramî û şeraketa rasteqîne gefên siyasî yê niha ya Iraqê derbas bikin û eve jî xistin rû ku bi bê tewafuq û şeraketa rasteqîne proseya siyasî birêve naçê û hîç destkeftêk jî ji bo tu aliyek pêknayê.

Li beşekî dinê vê hevdiînê de

## Egid: Nêrîna me li Sûriyê serkeft

Endamê Desteya Danûstandinan a Opozîsyona Sûriyê û Nûnerê ENKSê Hewas Egîd got, ku bi armanca çareserkirina pirsgerêka Sûriyê hewldanên wan ên dîplomatîk ji bo komkirina piştgiriya navdewletî berde- wam dike.

Encûmena Nîştîmanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) ragihandibû, ku şandeye wan serdana Fransayê kiriye û dê rojên pêş de serdana Qahîre û Riyadê jî bikin.

Li ser vê mijarê Endamê Desteya Danûstandinan a Opozîsyona Sûriyê û Nûnerê ENKSê Hewas Egîd beşdarî bûltena Rojava ya Rûdawê bû û got: "Di hemû hevdiînên me de mijara Efrînê rojeva sereke ye. Fransa şîrîk û aliyêke girîng ê navdewletî ye di pirsgerêka Sûriyê de û xwedî nerîn e. Fransayê soz da ku alîkariyê bidin xelkê Efrînê."

Egîd herwiha got: "Mijareke sereke yê din jî vegera xelkê Efrînê û derxistina çekdarên li wê herêmê bû, ji bo aramî çêbibe."

Li ser pirsê, "Fransa derbarê siberoja Kurdan de çi difikire?" Egîd diyar kir: "Nêrîna Fransa diyar bû. Me di daxuyaniya xwe de destnîşan kir, nêrîna me yek e. Ew dibêjin bêyî çareserkirina pirsgerêka Kurd pirsgerêkên Sûriyê çareser nabe û divê di destûra nû ya Sûriyê de nasnameya Kurd diyar be. Em ê di hemû astan de alîkar bin."

Hewas Egîd destnîşan kir, ku dê şanda wan serdana Kahîre û Riyadê jî bike û got, ku weke ENKS têkiliyên wan bi gelek welatan re berdewam dike.

Komîteya Danûstandinan a

Opozîsyona Sûriyê ji bo lîjneya nivîsandina reşnivîsa destûra nû ya Sûriyê lîsteya navê 50 kesan dabû Nûnerê Neteweyên Yekbûyî li Sûriyê Stephan de

erkeve bi vî rêbazî. Ji ber ku piraniya xelkê Sûriyê îro penaber in. Armanca sereke ya şoreşa Sûriyê berdewam e lê ne bi şeweyekî ku komên çek-



Mîstûra.

Derbarê vê yekê de Hewas Egîd got, ku ENKS weke nûnerê beşeke fereh a Kurdên Sûriyê him bi awayeke serbixwe û him jî di çarçoveya rêkeftina wan a li gel opozîsyonê nûnerê wan di lîsteya nivîsandina destûra nû ya Sûriyê de heye.

Li ser erîşên hikûmeta Sûriyê yê li hember opozîsyonê û pêgeha ENKSê, Egîd got: "Dema şoreşa Sûriyê destpêkir armanca sereke azadiya gelên Sûriyê bû û herwiha bidestxistina mafên hemû gelan û gelê Kurd bû. Heta niha em nebûne şîrîkê şerê çekdarî û me ev yek nekiriye bijarde. Bi baweriyê me jî ev nabe pîvana bihêzbûnê di şoreşa Sûriyê de. Ji xwe rejîmê dixwest şoreş dest bavêje çekan da ku ew wan bi çek û bi riya zorê tine bike. Lê bi gumana me rejîm nikare bis-

dar li hin herêman dethilat in."

Endamê Desteya Danûstandinan a Opozîsyona Sûriyê û Nûnerê ENKSê Hewas Egîd da xuyakirin, ku di destpêka şoreşê de wan daxwaz kiriye ku pirsgerêk li gorî biryarên civaka navdewletî bi rê û rêbazên siyasî were çareserkirin û wiha got:

"Bi baweriyê me nêrînem me di wir de cîbicî dibin û nêrînen me serkeftî ne. Em ji vê nêrîna xwe aloz nebûne û me şûnde gav neavêtiye. Em di vî warî de tim xort in û di vê daxwaza xwe de jî berdewam in."

Egîd balkişande ser hebûna hêzên navdewletî li Sûriyê û diyar kir, ku hikûmeta Sûriyê nikare xwe biparêze lewma Rûsya, Îran û milîsên wan hikûmetê diparêze. Ji aliyê din jî Amerîka û Tirkiye jî ji rexekî ve di nav Sûriyê de ne.

Rûdaw



## Encûmena rêveberiya PDKê daxuyaniyek belav kir



Encûmena rêveberiya PDKê li Selahedîne bi serpereştiya Serok Barzanî civiya û piştî civîne dax-

serpereştiya Serok Barzanî civiya, di civîne de çar pirsên pêwendiya xwe bi PDKê, Herêma Kurdistan û Iraqê hebûn hatin gotûbêj kirin.

Babetên civîne li gor daxuyaniya PDKê ku, wêneyeke wê bo BasNewsê jî hat şandin ev bûn:

Rewşa Iraqê û encamên Helbijartinên Parlamentoyê ku, di roja 12.5.2018 birêve çûbûn.

Hewlên aliyên Kurdistanî û Iraqî bo pêkanîna kabîneya nû ya hikûmeta Iraqê.

Helbijartinên Parlamentoya Kurdistanê ku, biryare 30.9.2018 birêve biçin. Gotûbêj kirina rewşa PDK û guhertinên li ser postên hizbî.

BasNews

## Çekdarên DAIŞê 7 endamên malbata pasewanekî Hadî Amirî kuştin

Serokê Hevpeymaniya Fetih û emîndarê giştî yê rêxistina Bedir Hadî Amirî ragihand, ku çekdarên DAIŞê komkujiyek li dijî endamên malbata pasewanekî wî encam dane û 7 kes ji wan kuştine.

Amirî li ser wê bûyerê got: Hîna şerê DAIŞê berdewam e, şevê din li navçeyên Diyale, çekdarên wê rêxistina tundrew tevahiya endamên malbata pasewanekî min kuştin.

Şerê niha di nav hêzên Iraqî û çekdarên DAIŞê de, wek şerê heyfhanîne lê hatiye, çend rojan berî niha û ji bo heyfhanîne li ser kuştina 8 endamên xwe ji aliyê çekdarên DAIŞê ve, hêzên Iraqî dest bi operasyonê berfireh li dijî DAIŞê kirin.



Li dijî wê operasyonê jî, çekdarên DAIŞê li navçeyên rojavayê Nînewa û başûrê Diyale, dest bi êrîşan kirine û heya niha 14 kes kuştine û revandine.

Ev bûyerana di demekê de ne, ku di sala derbasbûyî de, serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî bidawîhatina çekdarên DAIŞê li Iraqê ragihandibû. [kurdistan24.net](http://kurdistan24.net)

## Milîsên ser bi Tirkîyê çar ciwanên Efrînê girtin

Li sibeha îro 07.07.2018ê çekdarên bi ser Tirkîyê ve, avêtin ser

ciwan girtin. Li gor jêderekî xwecihî ji Bas-



malên du welatîyên bajarê Efrînê yê Rojavayê kurdistanê û çar

Newsê re daye ragihandin ku milîsên grûpa Hemzat a bi ser

Tirkîyê, bi ser mala Qadir Hemreş de çûn û sê xortên wî bi behaneyê endamtiya wan bi PYDê re girtin û berên wan dan cihekî nediyar û pişt re mala wî welatîyî bi temam talankirin û dizîn. Herweha di heman kampîneyê de, dukandarê bi navê Hemûdê ku dikana wî li ser diwara Maratê ye, ji aliyê heman çekdaran ve, hate girtin

Ji alîkî din ve, grûpa feyleq El-şam, îro avêtin ser gundê Kêla yê navçeya Bilbilê û welatîyê bi navê Mustafa Elo girt û berê wî dane cihekî nediyar. Hêjayî destnîşankirinê ye milîsên bi ser Tirkîyê ve bi merema standina peran ji xelkê, welatîyan bêtirî carekê digrin û li hember serbestkirina wan peran distînin.

BasNews

## Wezaretê Bazirganiyê: Heta niha 50 hezar ton genim ji cotkaran hatiye wergirtin

Wezaretê Bazirganî û Pîşesazî ya Kurdistanê ragihand, heta niha 50 hezar ton genim ji cotkarên Kurdistanê hatiye standin.

Li Herêma Kurdistanê, beşek mezin ji cotkarên ku genim diçînin, hasila genimê xwe difroşin hikûmetê. Bi destpêkirina werza dirûna genim re wergirtina genim ji cotkaran jî dest pê dike.

Berpirsê giştî yê bazirganiyê li Wezaretê Bazirganî û Pîşesazî, Newzad Edhem ji BasNewsê re got, me ji roja 17 vê mehê ve dest bi wergirtina genim kiriye û heta niha jî didome.

Newzad Edhem her wiha got, heta niha ji cotkarên Hewlêrê 25 hezar ton, ji yên Duhokê 15 hezar ton û ji yên Silêmaniyê jî 10 hezar ton genim hatiye wergirtin.

Ew genimê ku hikûmeta Kurdistanê ji cotkarên



Kurdistanê distîne, difroşe hikûmeta Iraqê. Hikûmeta Iraqê jî her tona genimê pile yek bi 560 hezar dînar, yê pile du bi 480 hezar dînar û yê pile sê jî bi 420 hezar dînar dikirre.

BasNews

## Vê hilbijartinê temsilkariyê e miletê kurd tûnebû

Encamên hilbijartinê 24'ê hezîrana 2018î, bi serkevîna Serok komar Recep Teyip Erdoğan û bi tîkçuna hemî partiyên li Tirkîya yê encam da. Ya herî



balkêş ew bû ku HDP li Kurdistanê deng windakir, ger ne ji dengê ku CHP dan dê HDP benda 10% derbas nekiriba ya, dengê HDPê ew bûn ku dane Selahedîn Demirtaş ew jî ji 8% bûn. Min di gelek civatan de digot Erdoğan dê di gêra 1. de biserbikêvê jiber vê ez matmayî nebim.

Vê hilbijartinê temsilkariyê e miletê kurd dernexist, nebire parlametoyê. Di vê hilbijartinê de sîstema parlamentiyê hilweşiye, Serokatî dê bikevê jyanê. Em hêvi dikin ku dê him ji bona Kurda, him ji ji bona civakê dê baştir be, lê em kurd ne li benda mafên millî û bi mezinin lê dê ji demên derbasbûyî çêtir be. Ez bawer dikim ku pêvejoyek bi rengê rewşa demokratîk bi kurdan re bête danîn.

Li gora me, HDP ne di wê ast û xwedî vîzyonekê ye ku ev iktidar li gel tîkîlî danê. Ji xwe HDP doza mafê miletê Kurd nakê siyaseta wê cuda ye ji mesela Kurd ji vê yekê ti rirola bileyzê nîne.

Ger ku Kurd bixwazin rolekê bilîzin divabê partiyên netewî bi dilsozî ligel hevûdû bikevine nav hewildanan, xwe bi rêxistinî bikin da dang biçê guhê dost û dijminan ev erkê her welatperwerê Kurdistanîyane.

BasNews

## Rûsya daxwaz ji civaka navnetewî kir Sûriyê ji mayînan paqij bikin

Wezaretê Derve ya Rûsîyê di daxuyaniyekê de daxwaz ji civaka navnetewî kir ku, Sûriyê ji mayînan paqij bikin daku, penaberên wî welatî vejerin malên xwe. Di daxuyaniyekê de Wezaretê Derve ya Rûsîyê pêşwaziya imzekirina rêkeftina di navbera Şamê û rêxistina UNMAS a taybet bi rakirina mayînan kir.



Li gor rêkeftinê rê li ber pisporên rakirina mayînan tê vekirin ku, li hemû xaka Sûriyê karê xwe bi azadî bikin û pirsgirêka mayînan li wî welatî çareser bikin. Li gor daxuyaniya wezaretê derve ya Rûsîyê di salên (2016-2017) tîmên pisporên rûsî karî 4 kiryarên rakirina mayînan li Sûriyê encam bidin.

BasNews

## Endamên nû yên parlamentoya Tirkîyê sond dixwin

Endamên nû yên parlamentoya Tirkîyê dest bi sondxwarinê kirin, 2 ji wan girtî ne ji ber wê jî nikarin sond bixwin. Îro piştî nivro, merasima sondxwarinê ya endamên nû yên parlamentoya Tirkîyê dest pê kir. Hejmara endamên parlamentoya Tirkîyê di hilbijartinên îsal de zêde bû, berê 550 bû niha bûye 600. Parlamentera HDPê ya Colemêrgê Leyla Guven û parlamenterê CHPê Enîs Berberoglu girtî ne, ji ber wê jî nikarin tevî merasima sondxwarinê bibin. Li gorî medyaya Tirkîyê, serokomarê Tirkîyê Recep Tayyip Erdogan jî dê 9 vê mehê sond bixwe û kabîneya nû ya hikûmetê jî destnîşan bike. Piştî ragihandina kabîneya nû, rewşa awarte jî, ku ji havîna 2016 ve ji ber kûdetaya serbazî hatibû ragihandin, dê rabe. HDPê di hilbijartinên 24 Hezîrana îsal de 67 kursiyên parlamentoyê bi dest xistibû.

BasNews



## Ilham Ehmed: Rewşa Minbicê weke xwe dimîne

Hevseroka e ti guhertin di encûmenên bajarê Minbicê de nayê kirin.



Di daxuyaniyê ji kenala K24ê, hevseroka encûmena Sûrya demokrat Ilham Ehmed ragihand, ku ew ti guhertin di cencûmenên bajarê Minbicê de nakin.

Ilham Ehmed da zanîn ku, tevahiya wan şandên serdana Minbicê dikin, dixwazin ku aramî li wî bajarî were parastin. Ehmed tekez kir, ku pêwîst e rewşa Minbicê weke bîmîne, da ku bandora xwe li çareserkirina kirîza Sûryê jî neke.

BasNews

## Şirketa Golf Keystone dê rojane 55 hezar bermil petrol ji bîrên Şêxanê derxîne

Şirketa petrolê ya Golf Keystone dê rêjeya petrola ku li Herêma Kurdistanê derdixe, zêde bike.



Ajansa Reutersê daye zanîn, şirketa petrolê ya Golf Keystone, ku li bîrên petrolê yê devera Şêxanê ya Duhokê petrolê derdixe, bi hikûmeta Kurdistanê re rêkeftinek nû îmze kiriye.

Di raporta Reutersê de hatiye gotin ku li gorî wê rêkeftinê, Golf Keystone dê di nav sal-sal û nivê bê de hewl bide rojane 55 hezar bermil petrol ji bîrên Şêxanê derxîne.

Li gorî agahiyan, Golf Keystone dê sala 2019 zêdetirî 200 milyon dolar bo geşkirina bîrên petrolê yê Kurdistanê xerc bike.

BasNews

## RQÇK: Rêjîma Sûryê gaza Kilorê li Dûma bikar anîye

Ajansa Reuters, ji raporeke Rêxistina Qedexkirina Çekên Kîmawî veguhestiye, ku rêjîma Sûryê di êrîşa li ser bajarê Dûma de, li rojhilatê Şamê gaza Kilorê bikar anîye, ku di encama wê de, bi dehan kes canê xwe jidest dan û gellek welatîyên din jî birîndar bûn.



Herwiha di raporê de hatiye tekezirin, ku ew nimûneyên ji cihê wê êrîşê hatine bidestxistin, corên cuda ji madeyên Kilorê di nav wan de hatine dîtin.

Rêxistina navhatî di rapora xwe de diyar kiriye, ku ti belgehek bidest wan neketiye, ku gaza damaran di wê êrîşê de hatibe bikaranîn.

Li gorî Çavdêrgeha Sûrî ji bo Mafên Mirovan, di Nîsana derbasbûyî de, rêjîma Sûryê bi çekên kîmawî êrîşî bajarê Dûma kir û di encamê de, sed û pêncî kes hatin kuştin, di nav wan de jin û zarok hebûn û bi sedan kes jî bihna wan çikiya.

kurdistan24.net

## Partî: Vê carê postê serokê Iraqê ji mafê me ye

Civîna Encûmena Serkirdatiya Partî bidawî hat û biryar da, ku amadekariyên xwe ji bo hilbijartinan firehtir bike û tekez kir ku pêwîst e hilbijartin di dema xwe de bîn encamdan.

Nûçegihanê Kurdistan24ê Hoşmend Sadiq ji cihê civînê ragihand, ji ber ku şandê Hevpeymaniya Fetih li Hewlêrê ye, daku li gel Partî bicive, civîna Encûmena Serkirdatiya Partî hat kêmkirin.

Her di wê civînê de, biryar hat standin ku Arif Teyfûr li şûna Fereydûn Ciwanroyî bibe endamê polîtîbroya Partî.

Di daxuyaniyê de ji Kurdistan24ê re, Arif Teyfûr got: Ez sipasiya Serok Barzanî û Encûmena Serkirdatiyê dikim ku min ji bo wî erkî hilbijartin û ezê ji wê pêgehê xizmeta xwe berdewam bikim.

Piştê peyvdarê Partiya Demokrat a Kurdistanê Mehmûd Mihemed, di kongirêkî rojnamevanî de got: Rewşa niha ya siyasî û hilbijartinên Perlemana Iraqê û encamên wê û pêwendiyên me li gel derve û hilbijartinên Perlemana Kur-

distanê, ku biryar e 30 Êlûna dahatî bîn encamdan û rewşa navxwe ya Partî hatin gotûbêjîkirin.

Derbarê daxwaza paşxistina

hevbeş biçe Bexdayê û Partî û YNK bernamêyê hevbeş amade bikin û pêkve beşdarî bikin.

Derbarê guhertinên di nav Partî



hilbijartinan, Mehmûd Mihemed got: Pêwîstiya rewşê bi wê yekê heye, ku hilbijartin di dema xwe de bîn encamdan, daku Perleman çalak bibe û dibe ku ew yek bibe sedema çareseriyê beşekî kêşeyan.

Di bersiva xwe de li ser pirseke nûçegihanê Kurdistan24ê got: Me li gel YNK lihev kiriye, ku komîteyê

de, Mehmûd Mihemed got: Pêwîstiya vê pirsê bi lêkolînê heye, daku em zanibin li ku guhertin pêwîst e. Ji bo wê mebestê jî Encûmena Serkirdatiyê desthilata xwe daye serok Barzanî û polîtîbroyê. Derbarê postê Serokatiya Iraqê jî got: Vê carê ji mafê Partî ye ku postê serokê Iraqê werbigire.

kurdistan24.net

## Tevgera Gorran bersiva wezîrê derve yê Tirkîyê da!

Tevgera Gorran bi daxuyaniyê fermî ve bersiva wezîrê derve yê Tirkîyê Mevlûd Çavuşoglu da.

Daxuyaniya Tevgera Gorran

je: "Rêveberiya Hewlêr û Bexdayê piştevaniya êrîşa me ya ser PKKê dikin, lê Gorran û YNK piştevaniya PKKê dikin û ji ber wê jî baca wê

Mistefa ve ragehandiye ku, Tevgera Gorran piştevaniya kurdên dervey herêm û Iraqê dike ku mafên xwe yê netewî û çandî bidest bixin û herwaha di bin ronahiya zagonên mafên mirov û yasayên navnetewî û beyana netewên Yekbûyî piştevaniya wê dike.

2- Tevgera me hêzeke siyasî, sîvil û bê çek e û awayê kar kirina wê çareseriyê pirsgirêkan bi rêya guftûgo û xebata sîvil ve, dûr li tundiyê bi rêyên aştiyane rast dibîne.

3- Hikûmeta Tirkîyê di pratîkê de û naha jî bi zimanê Çavuşoglu ve cudatîyê dixwe navbera Hewlêr û Silêmaniyê û rê nade hatûçûna balefirên navbera Silêmaniyê û Tirkîyê pêkbê û vê yekê zîyan gehandiye beşek zêde ya hemwelatîyên li deverê.

Dawiyê de jî em dibêjin daxuyaniyên waha, rev e ji çareseriyê aştiyane ya pirsgirêkan û aloziya li navçeyê kûrtir dike.

BasNews



waha ye:

Di daxuyaniya wezîrê derve yê Tirkîyê birêz Mevlûd Çavuşoglu de, Tevgera Gorran bi alîkarî dayîna Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK)ê tê tometbar kirin û Çavuşoglu dibê-

didin."

Em wek Tevgera Gorran radigehînin:

1-Tevgera Gorran na veşêre û di gelek boneyan de û berê jî li ser zimanê xwedê jê razî Newşîrwan

## Ji bo DAÎŞê dadgehek navdewletî tê vekirin

Ji bo darizandina endamên DAÎŞê di qada navnetewî de, li Holandayê bajarê Lahey di kongreyî de avakirina dadgehek navnetewî hate gotûbêj kirin. Di civîna ku ji bo avakirina dadgehek navdewletî hatî çêkirin de, berpîrsên koneya Ewlehiyê yê NY, siyasetmedar. Hukukzan, mirovên kesên bûyîn qurbanîya DAÎŞê û berpîrsên Iraqî amade bûn.

Parlementerê Holandî Pieter Omtzigt pêşengiya ve gave dike. Gelek endamên DAÎŞê li Iraqê heja tî darizandin, lê ji bo gelekî ndadgehên Iraqê tîrê nake û di cih de biryara darvekirina wan didin.

Di civînê de pisporê komkujîyan Prof. Gregorg Stanton axivtinek kir û got: Darizandina DAÎŞê ne ewe ku mirov edaletê li kesên mexdûr belav bike. Divê mirov tê bigihê ku ev zîlm û zordestî ji bo çi çêbû, sedemên ve bûyerê baş fam bike.

Parlementerê Hollandî Pieter Omtzigt dide xuyakirin ku niha pêwendiyên wan di vê derbarê de li gel Bexda û

Kurdistanê Başûr hene.

Ji bo rewşa Suriye niha ne mimkine ku pêwendiyekî



li gel Bişar Esad ji bo vê babetê bê danîn.

Ji aliyek din de ne hemû endamên DAÎŞê li vê dadgehê bêne darizandin. Tenê ewên berpîrsiyar û yê ferman dayîn de bêne darizandin.

rojvakurd.com

## Derbarê rêya Hewlêr- Koya biryarek hat dayîn



Derbarê hatûçûna otombîlên barhilgir li ser rêya Hewlêr- Koya rêveberiya hatinûçûnê biryarek da.

Rêveberê hatinûçûnê yê Koya Zahir Mihemed ji BasNewsê re ragehand ku, bi armanca kêmkirina qerebalixê li ser rêya Hewlêr- Koya biryarek hat standin, li gor wê biryarê ji demijmêr 6:00 sibehê heta 8:00 êvarî ve hatinûçûna otombîlên barhilgir li ser wê rêyê qedexeye. Da zanîn ku, ew biryar li roja 8.7.2018 çibecî dibe.

Li gor maran di heyama 6 mehan de li ser rêya Hewlêr-Koya 100 bûyerên hatinûçûnê rûdan, di encam de 10 kes canê xwe ji dest da.

BasNews



# Rostemê Zal û Feremezê kurê wî -2

Êvarê, gava ku Canpolat hat, maşoqê piştta xwe pêda kir. Dêwê Canpolat got, go: -Ha, go, maşoqa min, çi hesabê teye, te piştta xwe minda kir? Maşoqê jêra got, go: -Kafiro, tu wekî maşoqê minî, tu çima qe gilîyê xwe ji minra navêjî? Dêwê Canpolat got: -Gilîyê çi tera bikim, dilê teda bûye xem? Maşoqê gotê, go: -Wekî ez maşoqa teme, tu çima pîrsa xwe rast ji minra navêjî? Dêwê Canpolat got: -Çi pîrsek ez ji tera bêjim? Go: -Wekî tu aqasî serê şêr, pilinga, perwanda jêdikî, çima tu salixê xwe jî minra nabêjî. Canpolat got: -Wekî usane, qewata min, ruhê min sê cûcikin, wê di nava qutîke pola, nava gurzê mindane. Ez wekî têkevîm şera, dehwa, dareke serê milê mine: ez dar davê mî, yê ku bi minra şer dike. Min kê gava gurzê xwe avît, ew li ser bisekine, gurzekî orta gurzê min xîne, qutîkê ji orta gurzê mindane: sê cûcîkê têda ruhê minin, di orta qutîyêdane. Ewê ku minra şer bike, here ewê qutîyê derxe, serê wan cûcîka jêke, paşê ezê ji dinê xilaz bim, ezê îja bimrim, ew ki ji tera rast divêjim, ser her milekî min beraşekî aşa têdane. Ez beraşê xwe bavêjim, yê ku minra têkeve dehwe, beraşê min wekî kuta bûn, paşê qutîya min da derxistinê, ezê bimirim Eva ji tera divêjim diha.

Feremez xwera guhdarî dikir. Sekinî hetanî subhê. Subhê Canpolat rabû, çû nêçîra xwe. Feremez maşoqêra got: -Gilîyê te qe çi bûn? Maşoqê got: -Feremez, qurbana tebim, çima tuyî neyî hişyar bûyî, min pîrs ji Canpolat kir, hal û hewal, Canpolat ev gilî gotibûn. Feremez got: -Maşoqa dêwê Canpolat, kergedanê min derxe ji derva. -Lingê xwe kire zengûya sehetê: "Ya ullah ometê". Feremez go maşoqa dêwê Canpolat, got: -Canpolat sibê kê rê diçe, êvarê kê rê tê? -Feremez, go, ez qurbana tebim, go, heyfa te, tu cahilî, çevê te min û bedewîya min ketîye. Feremez go: -Maşoqa dêwê Canpolat, serîke ew oxire. Feremez çû pêşîya dêwê Canpolat. Dêwê Canpolat bala xwe dayêda, hew nihêrî têşkekî kurêşîya têra derket, go: -Wey têşkê kurêşîya, berxê hemlikê, ne beranê qird, îsal bû heft sal, ez li ezmana digeryam, diranê min diêşîya, ezê ancax te, têşkê kurêşîya têxime nav diranê xwe: ne ji minra dive şiv, ne dive teştê.

Ez li ezmana digeryam, diranê min îsal heft sale diêşîya, ez belkî heve goştê wî têxim nav diranê xwe. Feremez go: -Kafiro, dinya dore, yan bi zore? Canpolat jêra got: -Dinya bi dore. Feremez go: -Canpolat, dora teye. Canpolat darek avîte Feremez, Feremez zengu avîte kergedanê xwe. Sivik bû, ji ber revî. Dar jê negirt, Canpolat got: -Benî ademê axa axê, min lêxist bû ax, topax, goştê wî têra diranê min nema. Feremez ajot li ser: -Can-

polat, dinya dore, yan bi zore? Canpolat go: -Dinya dore. Feremez şûrê xwe lêxist, revî çû dera hana, jê dûr ket. Canpolat beraşê aşa milê xwe deranî, avît Feremez. Beraşê aşa jê negirt. Beraşê din jî – ew jî avît, dîsa jê negirt. Feremez ajote li ser dêwê Canpolat, şûrek li qafê wî xist, sêsid şêstûşes tamarê anîya dêwê Canpolat tevî hev bûn – çawa têşkê kurêşîya minra têkeve dehwe. Destê xwe avîte gurzê xwe, gurzek avîte Feremez. Gurzê wî çû, gelekî jê dûr ket. Feremez ajote ser gurzê Canpolat. Li ser gurzê wî peya bû. Gurzek Feremez orta gurzê wî xist. Bala xwe dayê – qutîk ji orta gurzê wî derket.

Derê qutîyê vekir, bala xwe dayê – sê cûcîk qutîyêdanin. Feremez serê cûcîkê jêkir. Dêwê Canpolat go: -Têşkê kurêşîya, tu birê minî mezinî, heyfa min, serê cûcîkê dinê jê meke, min ji dinyayê xilaz meke Feremez serê cûcîkê duda jêkir. Ruhê Canpolat hate qefesê, go: -Feremez, ji boy xwedêye, min ji dinyayê xilaz meke, tu birê minî mezinî, – ruhê wî hate qefesê, go: -Feremez, tu qurbana şîretkara xwebî, heft serî ser serê te hebûya, tu ji destê min xilaz nedibûyî Feremez serê wê cûcîka mayîn jî jêkir. Li ser serê wî peya bû, herdu guhê wî jêkir, hanî li ber maşoqa Canpolat danî. Sekinî, maşoqê rabû sêsid şêstûşes şax ji xwe dane berdanê, ji gaz û gerdena, çev-birû-bijanga, dev-lêvê di şekirî, ji xwe da berdanê. Sekinî heta êvarê, yataxa xwe û Feremez tev danî. Feremez nav yataxada danî. Maşoqê, ewê jî kincê xwe ji xwe şiqitand, orxan hilda, bin orxanê paşla Feremezda danî Feremez şûr tezîkir, orta xwe û wêda danî. Maşoqê go: -Feremez, go, qurbana tevîm, gelo te çi qîşûr canê minî naziknermikda dî, te şûr tezîkir, orta xwe û minda danî? Feremez jêra, maşoqa dêwê Canpolatra got: -Ez adkarim, ez heme Feremezim, kurê Rostemê Zalim, ez pey qaçaxa bavê xwe ketime. Hetanî ez neçim, bavê xwe nebînim, şuxulê usa ji minra herame. -Ha, go, Feremez, ez qurbana teme, dêwê Perwande îsal bû heft sal ewî û Rostemva şer kir; yek yekî alt nekir. Hema îsal bû heft roj Perwande bavê te alt kir, usane, ada behrêdane. Perwande ji qafî seqete, ew şivanê nêrîyane, here dûr bisekin, xwe bavê li ber kevera, dengekî lê têxe gazî, bêje: "Perwande, maşoqa dêwê Canpolat gotîye, bira nêrîyê kever, nêrîyê reş ji minra bişîne, bê". Perwandeyê rave ser xwe, kêleka xwe binhêre – kes tune. Perwande ji qafî seqete, wê bighîje nêrîya, ji nava pêz veqetîne, wê pêz devê behrêda bikişîne. Gava ku pez bir, here nêrîya ji minra bîne were. Feremez çû nêrî hanîn, maşoqa dêwê Canpolat go: -Feremez, serê nêrîya jêke, ji minra eyarke. Feremez nêrî hanîn, serê nêrîya jêkir, postê

wana eyar kir. Maşoqê wêderê îsmekî xwend: -Feremez, ha ji tera postê nêrîya tulixke: îsmekî min xwend, evê şiva min bive here li devê behrê, herdu postê nêrîya siyarbe, şivekê lêxe: "Postno, min derxin ada behrê". Feremez post birin ada behrê, li ser posta siyar bû, şivek lêxist, îsmekî serê xwend. Posta Fere-



mez ada behrêda derxist. Çû li ber koçka dêwê Perwande, lênihêrî xortekî delal têra derket.

Qîrîn ji maşoqa dêwê Perwande hat: -Han, go, gelo tu xwayê çend serîyayî, eva koçika dêwê Perwandeye: ez nizamim milyaketa tu ji ezmana kirî xar, nizam cêr-îcata ji erdê tu derketî? Go: -Maşoqa dêwê Perwande, hazir bibîne. Go: -Çawa, yekî nola Rostemê Zal, wekî dikire qîrîn – kûsî, mesîya ji qîrînîya Rostemê Zal serê xwe ji behra derdixist, teyamîş neda ber Perwande, niha tuyê teyax bidî? Feremez jêra go: -Maşoqa dêwê Perwande, ez heme, ez kurê Rostemim, Rostemê Zalim. Ez pey qaçaxa bavê xwe ketime. Maşoqê go: -Feremez, ez qurbana teme, îro bû heft roj, Perwande Rostem alt kirîye, hema mixenetî nekuştîye. Erd hanîye erdê: îro şes rojê wîye, heft qat bez li ser zikê Rostemin. Were ez dermana bidime te, tu bive here ber pozê Rostem. Agir li ser zikê Rostem bide alîkî. Te agir da alîkî, agir vênase. Dêwê Perwande kêderê heve wê dîyê agirê Rostem pêva bixwênbe, ah ji tera vî dermanî, bide ber pozê Rostem. Rostem wekî saxbe, dermanê bihele, bikeve pozê wî. Derman kete pozê wî – were cabê bide min. Feremez derman da ber pozê Rostem. Derman helîya, kete pozê Rostem, nalîn ji wî hat. Feremez devê xwe kire

guhê Rostem, dengekî "bavo" kir. Rostem dengê Feremez nas kir. Ew neket heyra xwe, birînê xwe, kete heyra Feremez. Feremez rabû çû cab da maşoqa Perwande. Feremez go: -Maşoqa dêwê Perwande, mizgîna min ji tera, Rostem silamete. Maşoqê go: -Feremez, de were evê karpêta-cila hana, were em

bala xwe bidê ku tu tapa Perwande naynî, Rostemê dengekî lê têxe qîrîn Perwande wê ser situyê xwe vegere Perwandeyê hilaniye, wê xwe pêra bighîne, qedemê Perwande wê ji qudûm bikevin, destê teda wê qudûm bikeve. Wî çaxî tu çok bide ser dilê wî, bêje: -Perwande, ez te nakujim, te çawa mixenetî bavê min nekuşt, ez jî te nakujim, hema gilîkî min tera heye, tê min, bavê min, me bivî wî alîyê avê. Ezê textebana te ser serê te bidime girêdanê: tu min, bavê min ji behrê derbazkî, reşê wê daynî. Feremez usa jî kir, paşê destê wî piş piştêva girêda, çû textebana Perwande anî û serê wî danî. Rostem li ser serê textebanê wîda rûnişt. Maşoqa dêwê Perwande ew jî textebanêda rûnişt. Feremez got: -Perwande, rabe min û bavê min bive qeredanîyê dayne. Perwande rabû li ser xwe, da nava behrê. Behrê avîte fêza çoka.

Perwande duşurmîş bû, go: "Gelekî min zor, cefa min daye Rostem, ancax Feremez gihîşt bavê xwe, wekî heft serî ser serê min bin, ez ji destê Rostem, Feremez xilaz nabim". Perwande milê xwe ba dide, milê xwe vedike, destê xwe davê textebanê, orta behrêda ser destê xwe textebanê davêje qerdanîyê Perwande şûnda behrêda vedigere. Feremez lê dike gazî: -Perwande, go, wekî min xizna te bir, maşoqa te bir, hergê tu qoçaxî, were dehwe bibîn. Perwande go: -Ez ancax ji destê te û Rostem xilaz bûme. Ezê subê herim maşoqeke dinê bînim xwera. Feremez, maşoqa Perwande, Rostem diçin. Maşoqa Canpolat ji xwera lêdinhêre, bala xwe dayê – Feremez wê hat, maşoqa Perwande hanî, Rostem jî xwera hanî. Maşoqa Canpolat çû pêşîyê, hanî li koçka xweda danî. Wê şevê wêderê bûne mêvan. Sekinî hetanî subê. Subê Rostem, Feremez, Guhdardî Pîr, Tûzî Nezer ji koçka Canpolat hatin koçka dêwê Sipî. Wê şevê koçka dêwê Sipî bûne mêvan. Roja mayîn – maşoqa dêwê Sipî hildan çûne mêvanê maşoqa dêwê Sor. Rabûn, subê maşoqa dêwê Canpolat, maşoqa dêwê Perwande, maşoqa dêwê Sipî, maşoqa dêwê Sor hildan – berê xwe dane şeherê Zalê. Mizgîn birin dane Zalê. Zalê, Gerdenkêşan, Xewserî Şêr, Cegerman, Bedîhcemal, ew jî hatine pêşîyê. Maşoqa dêwê Sor dane Guhdardî Pîr. Maşoqa dêwê Sipî dane Tûzî Nezer, maşoqa dêwê Canpolat dane Feremez, maşoqa dêwê Perwande dane Bedîhcemal Teze def û dewatê xwe kirin. Ew çûn mirazê xwe şa bûn. Sê sêv derketin cinetê: yek para hostayê min, sêvek para hikyatbêj, sêvek jî para cimetê. Kêmasîk jî hergê hebe, ew jî gerekê bibaxşînin. Mirazê te jî zarê te bivin. -Ez jî gelekî razîme.



## "E b a d î d i x w a z e kudetayeke serbazî bike"

Li ser ew nûçeyên behsa rêketinekê di nav serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî û wezîrê berê yê bergiriyê Iraqê Xalid Ubeydî dikin, ku niyeta wan heye kudetayeke serbazî encam bidin, daku Ebadî di desthilatê de bimîne, Hevpeymaniya Fetih bi



serokatîya Hadî Amîrî, helwesta xwe da xuyakirin.

Serkirde di Hevpeymaniya Fetih de, Amir Fayiz ragihand, ku zehmet e niha û di pêşerojê de jî, kudetayek serbazî li Iraqê bê encamdan. Ew nûçeyên behsa vê yekê dikin ne rast in.

Amir Fayiz diyar kir, ku bawerîya hemû hêzên siyasî bi destawdestkirina aştiyane ji desthilatê re heye û hemû jî pêbendî encamên hilbijartinan in.

Fayiz zelal kir, bihêztir sedem ku nahêle kudeta çêbibe, ew e ku piraniya aliyên siyasî, baskê wan yê serbazî heye û ew baskê serbazî wê parastina baskê xwe yê siyasî bike.

Berî niha çendîn dezgehên ragihandinên û çalakanên torên civakî li Iraqê, nûçeyên rêketinekê di navbera Ebadî û Ubeydî de, ji bo encamdana kudetayeke serbazî belav kiribûn û diyar kiribûn, ji ber ku Ebadî dixwaze careke din di postê xwe de bimîne, wê kudetayeke serbazî bike. **kurdistan24.net**

## Opozisyona Sûryê: Rûsya xwedî li sozên xwe derneket

Peyvdarê Hevpeymaniya Opozisyona Sûryê Enes El-Ebdê di kongîrekî rojnamevanî de li bajarê Stenbolê ragihand, ku binpêkirina rêketinan li başûrê Sûryê zêde bûye û Rûsya xwedî li wan sozên xwe derneket, ku berî niha dabû.



كوڤڤرەى رۆژنامەوانى شاندى ئۆپۆزىسيۆنى سووریا

Enes El-Ebdê diyar kir, ji encama şerê ku li başûrê Sûryê diqewime, bi hezaran sivil meşextî ser sînoran bûne, tevî ku parêzgeha Der'a yek ji navçeyên kêmkirina şer bû.

El-Ebdê bang li civaka navdewletî kir, ku bi erkên xwe rabe û şer rawestîne, herwiha ji welatên cihanê xwest ku fişaran li Rûsya bikin, daku soz û biryarên xwe bicî bike û rê li ber kuştina sivilan bigire.

Ji 19ê meha derbasbûyî ve, hêzên rêjîma Sûryê bi piştevaniya Rûsya û milîsên Îranî, dest bi operasyonê berfireh li dijî hêzên opozisyonê li parêzgeha Der'a kiriye. Li gorî amarên nefermî, heya niha bi deh hezaran welatîyên wê perêzgehê li ser sînorên Urdinê û Israîlê meşext bûne. **BasNews**

## Hikûmeta Kurdistanê gumrika tiştên biyanî zêde dike

Wezareta Bazirganî û Pîşesazî ya Kurdistanê, bo piştevanîkirina berhemên hundir gumrika tiştên ku ji derve tîn Kurdistanê, zêde dike.

Berpîrsê karûbarên giştî li Wezareta Bazirganî û Pîşesazî ya Kurdistanê, Şêx Aras Reûf ji BasNewsê re got, hikûmetê biryar daye gumrika ser tiştên ku ji derve tîn Kurdistanê zêde bike da ku şansê bazarkirin û firotina berhemên hundir zêde bibe.

Şêx Aras Reûf her wiha got, emê vê biryarê di demek kurt de û bi hemahengî li gel hikûmeta Iraqê bicîh bînin.

Wî rayedarê hikûmetê anî ziman ku li Kurdistanê berhemên mîna şîş, çîmento, tiştên xwarin û

vexwarinê û gelek berhemên din hene ku li hember yê biyanî sazî ya Silêmaniyê, Sîrwan Mihemed jî kîfxweşiya xwe li hem-



şansê wan yê firotinê nîne û got, ji ber wê jî me biryarek wiha da.

Serokê Odeya Bazirganî û Pîşe-

ber wê biryarê nîşan da û got, daxwaza me ew e ku ev biryar di demek kurt de bicîh were. **BasNews**

## Çîroka Berhevkirina Mîr Celadet Bedixan ji Alfabe Latînî re

Bi helkefta ku di roja 15ê vê Tîrmehê 2018'an de 67 sal di ser koçkirina Mîr Celadet Bedirxan re

dixwend û diedilandin. Min bala xwe dida Mêcer, bi lêvkirineke biyanî, lê bê dişwarî destnivîsa xwe dixwend.

an de, di gel hin nivîsên min ên din gihîştine pêşberê Mehkema Xarpûtê.



derbas dibe, werin em bi hev re çîroka berhevkirina wî ji Alfabe Latînî re nas bikin. Mîr Celadet ev çîrok di kovara Hawarê, hejmara 13'an de, sala 1932'an li Şam bi zelalî belavkiriye:

(...Ev elfabeya hanê ko îro em zimanê xwe pê dinivîsin paşîya xebateke salanên dirêje. Di sala 1919an de, me dabû çiyayê Meletiyê. Em ketibûn nav eşîra Reşwan. Mêcer Nowel (Ingilîzek) jî di gel me bû. Mêcer zarê nivro dizanîbû, dixebitî ko hîn zarê bakur bibe û ji xwe re her tişt dinivîsand. Min jî hin medhelok, stran û çîrok berhev dikirin. Carnan, me li nivîsên xwe çavên xwe digernandin,

Lê belê ez, heta ko min (Ü, و) ji (O, د) û (I, ی) ji (E, ئ) b. p derdixistin. Diketim ber hezar dişwarî. Ma çîman? Ji ber ko Mêcer bi herfên latînî, lê min bi herfên erebî dinivîsandin. Ser vê yekê di cih de, min qerara xwe da û ji xwe re bi herfên elfabeyek latînî. Êdî min bikariya destnivîsa xwe paş hezar salî jî, bê dişwarî û weke xwe bixwînim, ji ber ko her deng cihê cihê li ser kaxezê di hate sekinandin.

Wekê em veşeriyên hatin Stenbolê, bi vê elfabeyê min kitêbeke elfabeyê û ferhengêke kiçik nivîsand û ji bona çapê kar kirî bûn. Lê mixabin ne ew elfabê, ne jî ew ferheng îro di destê min de ne. Di sala 1925

